Yazdır | http://www.yeniozgurpolitika.org/?bolum=haber&hid=56712

Yeni Özgür Politika

'AKP kurdên bi rengê xwe dixwaze'

27 Subat 2010

„AKP tiştê dike, heta niha ne kemalistan û ne jî artêş bi destxistî dike. Li hember kurdan durûtiyê dike. Olê bi kar tîne û bi têgihiştina osmaniyan nêzî kurdan dibe."

Dr. Nikolaus Brauns, rojnamevan û nivîskarê rojnameya Junge Welt e. Her wiha di Parlamentoya Almanyayê, ji bo Parlamana Ulla Jelpke karê siyaseta hundir dike. Dîrokzan e. Niha li Berlinê Buroya Solidaritaetê kar dike. Heta niha 9 caran çûye Kurdistanê û der barê PKK'ê de pirtûkekê dinivîsîn e ku meha 4'an derdikeve. Têkildarî pêşveçûnên li Tirkiyeyê yên têkildarî pirsgirêka kurd û rewşa kurdan a li Almanyayê Dr. Nikolaus Brauns pirsên me bersivandin.

Hûn mîna siyasetmedar û rojnamevanekî alman pirskirêka kurd û rewşa Tirkiyeyê ji nêz ve dişopînin. Em bi polîtikaya hikûmeta AKP'ê dest pê bikin. Polîtîkaya AKP'ê ya li hemberî kurdan hûn çawa dibînin?

Siyaseteke ne durist dike. Tiştê ku AKP'ê dike heta niha ne kemalistan û ne jî artêşê pêk anîbû. Li hemberî kurdan durûtiyê dike. Olê bi kar tîne. Bi têgihiştina osmaniyan nêzî kurdan dibe. Lê polîtîkayên nû. Li ser navê olê dixwaze kurdan ji rastiya wan dûr bixe. Ev polîtîka polîtîkayên osmaniyan in ku li hemberî gelek gelan bikar anîbûn. Îro AKP van polîtîkayan nû û dubare dike. Ne mimkûne pirsgirêka kurd bi şêwazê nêzîkbûna osmaniyan were çareserkirin.

Çi dibêje AKP? Dibêje; 'bila kurd bi zimanê xwe biaxivin, tu astengî li pêşiya zimanê wan nîne, lê bila ne bi fermî be. Bila kurd navê gundên xwe bi kar bînîn li bila ne bi fermî be.' Bi vê nêzikbûna xwe AKP dibêje ji bo çareseriyê me gav avêtine. Lê ne rast e. Hebûna kurdan hêj ne pejirandiye. Bi zimanê dayikê ku zimanê dayikê hebûna mirovan e qedexe ye. Rêxistina kurdan wekî sûc dibîne û li pêşiya rêxistinbûyina civaka kurd astengiyan dertê xwe. Kurdên bi rengê xwe dixwaze. Kurdan bi rengê wan qebûl nake. Ji bo vê qasê jî siyasetmedar û şaredarên kurd diavêjin zîndanan. Her wiha partî û saziyên kurdan digirin.

Ji bo çareseriya pirsgirêka kurd PKK'ê gelek caran agirbest îlan kir lê wan agirbestan bersiv nedît.

Helbet di cih de ye ku aliyê kurd her dem amade ye û dixwaze pirsgirêk bi rêbazên aştiyane bê çareserkirin. Amade ye ji bo diyalogê. Ji bo vê qasê ji kurdan gelek caran agirbest îlan kir. Lê bersiv her dem neyînîbû û li ser gerîlayên kurd bombe hatin barandin. Dewlata tirk heta niha ji bo çareseriya pirsgirêka kurd gavek ne avêtiye. Hikûmeta AKP'ê ji polîtîkayên dewletê pejirandinê û li gel artêşê dimeşe. Gelek rêbazan jî li hemberî kurdan bi kar tînê. Dibêje 'Di aliyê demokrasiyê de, ji aliyê mafê mirovan ve min gelek gav avêtine.' Lê di rastiyê de li ser gelê kurd terora deweletê dimeşine. Alîkariyê ji gelek dewletan digire, her wiha ji NATO'yê digire û li hemberî kurdan bi kar tîne. Bi vê riyê gelek generalên tirk dewlemend bûne. Ev general naxwazin pirsgirêk bi riyên aştiyane çareser bibe. Dê derfetên wan ji destê wan derkevin. Her wiha ev nirxandin ji bo AKP'ê jî derbasdar e. AKP û artêş di mijara pirsgirêka kurd de hevkar in. Bi hev re dimeşin. AKP ji bo berjewendiyê xwe li gel atêşê dimeşe û xwe di nava sistemê de bicih dike. Heger bi riya aştiyane pirsgirêka kurd bixwaze bê çareserkirin divê muxatabên kurd ên rastî li ber çavan bigire. Muxatabên kurd jî rêxistinên kurdan e. Ev rêxistin jî PKK, KCK û BDP ye. Di nav daxwazên kurdan de demokaratbûna civakê heye. Kurd ji aliyê xwe ve amade ne. Lê ne sîstema tirk û ne jî civaka tirk ne amade ye.

Rêxistinên kurdan di nav civaka tirk de jî gelek pêşketin çêkirin, lê hêj gelek ked dixwaze. Çapemeniya tirk jî alîgirê şer e. Ew jî baweriya civaka tirk a li hemberî kurdan kêm dike. Sîstem ne amade ye kurdan bipejirîne, lê divê PKK û BDP di nav civaka tirk de xebatên xwe zêdetir bikin. Ev polîtîkayên di nav civaka tirk de encam bigire û sîstem dê tek biçe. Hikûmet û artêş hem bi derfetên dewletê hem bi riya çapemeniyê civaka tirk bêhiş dihêle û der barê nêzîkbûna aliyên kurd de bêagahî dihêle. Tenê pirsgirêka kurd weke 'terorê' nîşan dide. Lê eger gelê tirk li Stenbol û Îzmîrê jî bo çareseriya pirsgirêkê milyonek mirov rabe ser xwe wê çaxê sîstem dê tek biçe.

Dewleta tirk naxwaze Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û PKK muxAtab bigire. Heger Ocalan û PKK muxAtab neyên girtin gelo dê pirsgirêk çareser bibe?

Ji bo çareseriya pirsgirêka kurd daxwaz û pêşniyarên BDP, PKK, KCK û Ocalan nêzî hev in û hev temam dikin. Daxwazen ku neyên qebûlkirin ji nînin. Daxwaz daxwaza mafê xwezayî, mafê demokratîk û mafê mirovahî ne. Ya herî berbiçav jî ew e ku dibêjin em dixwazin siyaseteke legal bidin meşandin. Em naxwazin xwîn bê rijandin. Em perwedeya zimanê dayikê dixwazin. Her wiha ji bo van daxwazan bila şaredar û siyasetmedarên me neyên girtin. Ên hatin girtin bila bên berdan. Ev daxwaz ne daxwazên mezin in. Ev daxwazên herî maqûl in û mafê mirovahiyê ye. Her wiha Ocalan dibêje eger naxwazin bi min re rûnin bila rûnenên. Ne ez ne PKK astengiyan dernaxin. Dikare bi BDP'ê re rûne û pirsgirêkê çareser bikin. Eger nikarin bi wan re jî rûnên divê destûra bingehîn biguherînin. Helbet ne mimkûn e Ocalan û PKK'ê li ber çavan negirin. Ocalan û PKK berpirsyarên vê tevgerê ne. Bêyî wan ev pirsgirêk çareser nabe.

Baş dizanin têkliliyên dewleta alman û dewleta tirk pir xurt in, ji bo çareserkirina pirsgirêka kurd çima dewleta alman rolê nalîze?

Ev 150 sal in têkiliyên Tirkiyeyê û dewleta alman baş in. Sedema wê tekliya baş jî aborî ye. Ji ber wê Almanya her dem amade bû ji bo binpêkirinên mafên mirovan ji bo başbûna aboriya xwe. Dema em qedexeya PKK'ê ya li Almanyayê temaşe bikin ev rastî derdikeve ber çavan. Dema Almanya destûr bide PKK'ê ev zirarê dide têkiliyên aborî yên dewleta alman û Tirkiyeyê ji ser de. Bi rastî ev e sedemê qedexekirina PKK'e ya li Almanyayê. Almanya benzînê diavêje nava agir. Heta li Tirkiyeyê pirsgirêka kurd neyê çareser kirin, li vir zexta li ser kurdan jî ranabe. Ez bawer nakim qedexa ser PKK'ê jî rabe. Almanya li benda sînyaleke ji Enqereyê ye. Her wiha dewleta Almaya ditirse ku kurd xwe li wir bi rêxistin bikin û ev nikaribe daxwazê kurdan pêk bîne û wê êdî kontrol bike.

Li Almanyayê nêzî milyonek kurd heyê li hember siyaseta ku we behsa wê kir divê çi bikin?

Di destpêkê de divê kurd bibe pira navbera dostên xwe ên alman. Ew in ê herî baş şerê li Kurdistanê dikin û dibînin. Divê ji dostên xwe yên alman re bêjin. Divê kurd bêjin 'hûn me tirk dihesibînin lê em ne tirk in em kurd in û em bi daxwaza xwe jî nehatin Almanyayê. Artêşa tirk gundê me şewitaniyê û em neçar man dev ji welatê xwe berdin û bên vir. Ji ber panzerên Almanyayên yên ku dide Tirkiyeyê em hatine vir. Her wiha gelek kurd di nava partiyên alman de cih digirin û divê bigirin. Divê tiştên ku hatine serê wan bibin rojeva partiyan. Divê wan îkna bikin. Nabe serî li partiyan bixin dema li Tirkiyeyê cardin dewlet êrîşa li hemberî kurdan pêk tîne. Dema kurd li wir dijîn û xebatkar in divê xwe wekî xebatkarê dewletê bibînin. Her wiha dema li wir dixwînin xwe wekî xwendekarekî bibînin û hwd. Dema dewleta Almanya beriya demekê biryarek nû ya ji bo karibe mirovan bişopîne, gelek mirov li hemberî wê biyarê derketin û meş li darxistin lê saziyê kurdan beşdarî wan çalakiyan nebûn. Divê ew jî li hemberî wan qedexeyan û bi taybetî ji bo rabûna qedexeya li ser PKK'ê rabe çalakiyan li dar bixin. Ya herî girîng dema kurd li wir kar dikin bila cihê xwe di nava sendîkayan de bigirin. Di rewşeke wisa de dewleta alman dê nikaribe hesanî bi ser kurdan de biçe. Mirov li wir wekî mînak dikare nivîskar Haydar Işik bide.

Li Tirkiyeyê kedkarên TEKEL'ê di nava çalakiyê de ne, we wan ziyaret kir hûn berxwedana wan çawa dibînîn?

Me heta niha nedît bu ku li paydexta Tirkiyeyê polîs were li hemberî sendîka û kedkaran êrîşa pêk bîne. Ev mirov diçin ser rê tenê daxwaza kar dikin û nanê xwe dikin. Wan kedkaran digot wan hemûyan Partiya AKP'ê hilbijartibûn. Ev tiştekî nû bû. Ez matmayî mam bi berxwedana kedkarê TEKEL'ê. Niha sînor di navbera ol, netewe û cinsî de nemaye di nava kedkaran de ye. Piraniya kedkaran marşa Tirkiyeyê digotin û ala Tirkiyeyê radikirin, berî ez biçim, lê dema ez çûm hemû govenda kurdî digirtin û kefiya reş û spî rakirin. Wan kedkaran piraniya wan faşîzmê mezin bûn berê, bi hefteyan di nava çalakiyê de bûn. Lê piştre herî balkêş ew bû kedkarê kurd pereyê xwe kom dikirin û ji kedkarê tirk re xwarin û betanî dianî. Piştî parvekirina wan tiştan di navbera kedkaran de germahiyek mezin çêbû. Ez nizanim ev têkoşîna kedkaran çawa bi dawî bibe lê ez hêvî dikim bi encameka baş bi dawî bibe. Ez bawer dikim ev çalakî ji bo çareserkirina pirskirêka kurd jî pir girîng bu, BDP jî anîbû ziman ku dê piştgiriyê bidin kedkaran. Her wiha ez girîng dibînim ku KCK'ê û APO jî berdawam piştgirî bidin vê çalakiyê. Dibe BDP piştgiriya xwe wekî niha berdawam bike ev pir girîng e. Dewletê doz li wan vekir, lê ya girîng mirov baweriya gel qezenc bike û bi wî rengî berdawam bike. BDP ne tenê partiya kurdan a çep her wiha divê bibe partiya hemû kesên li Tirkiyeyê dijîn ên çep.

Li Kurdistanê û Tirkiyeyê rewş ber bi ku ve diçe?

Dewleta Tirk naxwaze çareseriyê, di nava hewldanan de ye ku planê nû çêkin çawa dikarin gelê kurd û tirk li hemberî hev bi kar bînê. Em dizanin partiya BDP'ê pêşî li vî şerî digire. Lê divê em vê ji bîr nekin rola APO li wir pir girîng e. Ew bi salane pêşiya şerê gelan digire. Min li herêma Kurdistanê gelek ciwanê kurd nas kirin di jiyana xwe de ji derve ji girtin, binçavkirin, îşkence û lêdan dîtine ji dewleta tirk. Ji ber wê kîna wan ciwanan li hemberî deweletê di asta herî bilind de ye. Ez di vir de talûkeyekê dibînim ku dema dewleta tirk wiha berdawam bike ku di pêşerojê de ev ciwan neyên û nayên kontrolkirin.

Her wiha vê dema dawî jî TAK jî xwe cardin anî rojevê. Berpirsiyarê wan tiştan jî tenê dewleta tirk e. Dewleta tirk wan tiştan provoke dike. Û kesê dikarin pêşiya wan tiştan bigire, digire binçav dikin, APO îzole dikin, DTP digirin û siyasetmedarên kurd digirin. Ev planê dewlata kûr e. Gelan li hemberî hev bi kar tînin. Mixabin dewleta tirk di lîstika artêşê de cih digire. Ji ber wê pir girîng e ku gelê kurd hişyar tevbigere û neyne provakasyona

dewletê.

YUKSEL TOPRAKLI / HANNOVER

© 2006 - 2007 Yeni Özgür Politika